Gesundheitsamt Frankfurt am Main

HEPMIG VORSTUDIE

Versorgungssituation von Hepatitis B und C in Deutschland bei Menschen mit Migration aus ausgewählten Ländern

ROBERT KOCH INSTITUT

## Hepatît B, C û D çi ye?

Hepatît B, C, û D enfeksiyonên ji ber vîrusan ne. Enfeksîyon dikare bibe sedema westandin û aciziya zik, carinan jî dibe sedem zerikê.

Xala giring ev e ku piştî salan enfeksiyonên dikarin rê li ber kansera sîroz û kezebê veke û di encamê de bibe sedem mirinê.

Vîrûsên hepatît B, C û D dikare bi rêya pêwendiya bi xwîna mirovên tûşî bûyî, seksa bêparastin a bi mirovên tûşî bûyî re, yan jî ji dayikeke tûşîbûyî derbasî zarokî bibe.

Enfeksîyon bi serkeftî dikarin werin tedawîkirin û vakslêdan li dijî hepatîta B û D yê leşî diparêze.

## Di lêkolîna HepMig de çi dibe?

**Komkirina xwînê:**
Kesek ji ekîba lêkolînê xwînê ji tiliya te yan jî rehê we distîne û dişîne laboratuarê. Ji bo hepatît B, C û D xwîn tê test kirin.

**Pirsname:**
Em jî ji we dixwazin ku hûn pirsên li ser tenduristî, gihîştina tenduristiyê, û faktorên rîsk ên gengaz bibersivînin. Tu dikarî vê li ser tableta me yan jî li ser kaxizê bikî. 15-20 deqîqeyan didome.

## HepMig li ser çi lêkolîn dike?

HepMig lêkolîneke li ser hepatîta vîrûsên B, C û D ye.

Vîrûsa hepatît bi taybetî li hin welatan, ku Romanya û Tirkiye jî di nav de hene, gelekî zêde ye.

Armanca lêkolînê ew e ku kesên ku li Romanya û Tirkiyeyê ji dayik bûne çiqasî bin bandora vîrûsê ne û lêkolîn bikin ka xizmeta tenduristiyê li Elmanyayê çiqasî radest wan bûne.

### Mebesta lêkolînê?

- Ji bo kesên li Romanya û Tirkiyeyê koç kirine, rê li ber pêşîgirtin û lênêrînê vekin.




## Kî dikare di lêkolîna HepMig de beşdar bibe?

- ✓ Temenê te herî kêm 18 salî ye
- ✓ Li Tirkiye yan jî Romanyayê ji dayik bibin
- ✓ Tu hê di vê lêkolînê de beşdar nebibî

Wê demê tu dikarî beşdarî lêkolînê bibî.

Beşdarbûn dilxwaz e û hertim dikare were betal kirin.

## Eger ez beşdar bibim, ez dê çi bidest bixim?

- Hûn ê li ser hepatît B, C û D yê da agahîyên balkêş bistînin.
- Eger hûn bixwazin, piştî 14 rojan hûn dikarin encamên testê ji navenda lêkolînê berhev bikin.
- Eger test erênî be, bijîşkê we dê encaman bi we ra nîqaş bike û di gavên din da ji we ra şîretan bike.
- Hemû beşdar 10 Euro werdigirin.

## Ez li ku û kengî dikarim beşdarî lêkolînê bibim?

- Hewceyî bi qeydkirinê nîne
- Wergêrê ziman tê radestkirin!

**Ji 4-ê Gulanê heta 16-ê hezîrana 2023-an**

**navenda Lêkolînê ya Beşa Tenduristiyê ya Frankfûrtê**

| **Dema xebatê:** | | **Navnîşan:** |
|---|---|---|
| Duşem | 8:00 – 13:00 | Zeil 5, Qata 2yemîn |
| Sêşem | 16:00 – 20:00 | Breite Gasse 28, Qata Yekem |
| Çarşem | 16:00 – 20:00 | Breite Gasse 28, Qata Yekem |
| Pêncşem | 8:00 – 13:00 | Zeil 5, Qata 2yemîn |
| Înê | 8:00 – 17:00 | Zeil 5, Qata 2yemîn |

Agahiyên din:

Tel.: 0178 9751912


Lêkolîna HepMig ji aliyê Enstîtuya Robert Koch ve bi alîkariya Daîreya Tenduristiyê ya Bajêrê Frankfûrtê pêk tê.

Ev lêkolîn ji aliyê Daîreya Tenduristiyê ya Federal ve tê fînanse kirin


KURDISCH